Ministerium für Kinder, Familie,
Flüchtlinge und Integration
des Landes Nordrhein-Westfalen

08.04.2021

Agahî ji bo dêûbavan

yên ku zarokên wan li zarokxane an li cihên mêzekirina zarokan tên mêze kirin

Agahî ji bo ragir, birêveberî û xebatkarên

zarokxane û navendên mêzekirina zarokan

Ji 11ê Avrêl 2021ê pê ve di zarokxaneyê de mêze kirina zarokan û testên xweser

Mêze kirina rojane ya zarokan li Nordrhein-Westfalenê dê piştî 11ê Avrêl 2021ê jî di bin şertên tengkirî de bi awayekî rekûpek bidome. Her weha hûkmên agahîyên fermî yên 26ê Adar 2021ê hîn muteber in.

Li cem şixulandina zarokxaneyan ku di bin şertên tengkirî de didome, wekî din pêşnîyarekî testêkî berfireh jî were pêk anîn. Ji hêla eyaletê ve ji bo hemû zarok û xebatkarên zarokxane û karmendên mêze kirina zarokan testên xweser tên amade kirin. Dêûbav wê li malê zarokên xwe test bikin. Bikaranîna testa xweser bi awayekî dilxwazî ye. Digel tedbîrên hişk ji bo pakijî(hîjyên) û derzîkirinên karmend û xebatkarên zarokxaneyê, vebijêrka ev testê, lêbelê, elementek girîngtir e, da ku parastina tenduristî û her weha parastinek dij enfeksiyonê xurttir bibe û bi vî rengî mêze kirina rojane ya zarokan were domandin. Vakslêdan(derzîkirin) li gorî şertnameyan Wezareta Kar, Tenduristî û Karûbarên Civakî ya berpirsiyar dê bên domandin.

Ji bo dest bi kar kirinê an wergirtinê pêşniyarê mêzekirinê zarokan îbraz kirina encamekî testê ne şert e.

Agahî ji bo testên xweser

Testên bi navê antijên ên bilez têne peyda kirin, ku piştî 15 deqîqeyan agahdariyê didin ka ev kes di dema testê de vegir(înfeksiyoz) e an na. Testên ku ji hêla MKFFI ve hatine kirîn, testên ku bixwe tên bikaranîn ku ji hêla Enstîtuya Federal a Derman û Amûrên Tibbî ve ji bo bixwe-bikaranîna ji hêla kesên ne zana ve hatine pejirandin. Testên xweser yên ku amade ne, bi rêya jêrakirinek(şivikek bi pembû) ji pêşiya pozê tê pêk anîn. Talîmatên bikaranînê yên pêvekirî ji bo vê vîdyoya perwerdehiyê kodek QR-ê vedigire:

https://h5.9fm.cn/jssg46?url=e666G_bDxSP2G

Van talîmatan li vir jî têne dîtin:

https://www.mkffi.nrw/corona-aktuelle-informationen-fuer-die-kindertagesbetreuung

Tedarîk û çarçoveya testên

Di hefteya 12ê Nîsanê 2021an de, dê yekem testên xweser li navendên mêzekirinê zarokan û xebatkarên mêzekirina zarokan bi navgîniya ragir û Buroyên Ciwanan ve werin belav kirin. Di heman demê de, teslîmatên din jî dest pê dikin, ku dê dûv re rasterast li navendan werin çêkirin. Ji bo mêzekirina rojane ya zarokan, teslîmkirin li Buroyên Ciwanan berdewam dikin. Wezaretê hejmarek têra testan sîparîş kiriye. Lêbelê, ev yekê jî mumkune ku di teslîmatê de derengî an kêmasiyên sivik çêbin.

Her heftî ji bo her kesê du testên xweser têne plan kirin, hem ji bo karmendan û hem jî ji bo zarokan. Navend bixwe ji bo belavkirina testan li karmend û dêûbavan berpirsiyar in.

Yekem, yekîneyên pakêtên bi pênc testan têne peyda kirin, yên ku li gorî wê têne belav kirin. Piştre jî, pakêtên tek bêne teslîm kirin.

Cih û dema testên dilxwaz

Divê karmend di derbarê cîh û dema testên xweser de bi navendê re hevahengiyê bikin. Xebatkarên serbixwe yên mêzekirina zarokan li ser berpirsiyariya xwe biryar didin.

Dêûbav li malê bi testên xweser ên ku hatine dayîn zarokên xwe test bikin û li ser dema test kirina zarokên xwe ev bixwe biryar didin.

Mijûlbûn bi encamên testê

Eger encama testê erênî(pozîtîf) be, divê karmend an xebatkarên mêzekirinê li zarokan nenêrin. Divê zarokan ku encama testê van erênî(pozîtîf) derketine, nên zarokxaneyê.

Encama testê xweser ya erênî ti berpirsiyariyek nade ku ev yekî were li beşa tenduristiyê rapor kirin. Lêbelê, divê derhal testek PCR li navendek testê an li nivîsgeha tixtorê malbatê were kirin. Divê ku heya roja testê hemû têkilî werin qut kirin û li malê karantînek were ava kirin. Eger encama testê PCR-ê erenî(pozîtîf) derkeve, divê gavên bêtir li gorî talîmatnameyên hiqûqî yên eyaletê an li gorî qerarên meqamên herêmî yên berpirsiyar werin avêtin. Ev di heman demê de ji bo vegera zarok li zarokxaneyê an ji nû ve destpêkirina kar ji hêla karmendan ve muteber e.

Wezareta Zarok, Malbat, Penaber û Entegrasyonê ya
Eyaleta Nordrhein-Westfalenê